Landesamt
für Flüchtlingsangelegenheiten
BERLIN

# Pêşbaziya nivîsînê ji bo penaberan – Çawa dişixule:

Em li hêviya bihîstina çîroka we ya di derheqê lêgerîn û dîtina xanî de ne! Ji bo we wateya malê çi ye? Hûn çi hêvî dikin? Mala we ya kevn û ya nû çawa bû? Hûn dikarin di derheqê tiştên ku bi rastî qewimîne an jî yên we ji ber xwe çêkirîne de binivîsin. Şêwe bi tevahî serbest e: Hûn dikarin çîrokekê, helbestekê, gotinên rapê an nivîseke polîtîk jî binivîsin - biryarê hûn bidin!

## Şertên beşdarbûnê - ji kerema xwe not bikin!

Ji kerema xwe ji me re du tiştan bişînin: nivîsara xwe û forma serlêdanê. Hûn dikarin forma serlêdanê ji vê rûpelê daxînin û tije bikin. Ji kerema xwe herdûyan bişînin schreibwettbewerb@laf.berlin.de

**Divê nivîsara we çawa be:**

- herî zêde 3 rûpelên DIN A4, mezinahiya tîpan 11
- Bi zimanê Almanî an jî zimanî hûn dixwazin binivîsin. Wergêrandin dê ji aliyê me ve bê kirin!
- Ji me re belgeyeke nivîskî bişînin (bi mînakî Word) Heke we kompûterek nebe, sepaneke axaftin-bo-nivîsê ya wekî Speechnotesbikar bînin.
- ji kerema xwe li serê nivîsara xwe navê xwe bikar neynin li şûna wê peyveke kilîlk binivîsin!

**KÎ dikare beşdar bibe?**

- Penaberên li Berlînê dijîn.

Wateya wê ev e ku: Hûn niha di pêvajoya penaxwaziyê de ne an we jixwe statûya rûniştinê ya di bin Paragrafên 22, 23, 24 û 25 ên Qanûna Îqameyê (AufenthG) wergirtiye an destûreke rûniştinê ya dem-kurt heye.

**Dibe ku hûn çi bidest bixin?**

- Xelatên pare an jî yên ne-pareyî yên cihêreng
- vexwendin ji bo çalakiyeke mezin a dawiyê
- nivîsarên bijare dê bi şêweya pirtûkê werin weşandin